



Heke cihêkarî qewimî, em çi bikin?

Antidiskriminierungsbüros NRW

Li ser hemda xwe bin û bi baldarî tevbigerin!

Heta heke bêhurmetî li we hat kirin an ji ber cihêkarî, hers bûn, karê herî baş di vê rewşê da ev e ku **ser hemda xwe bin û bi baldarî tevbigerin!** Gazindeya bi dengê bilind an gotinên tund û êrîşkerane li dijî cihêkariyê dûra dikare wekî lawaziyekê were hesêb. Hêrs nebin. Pirrîcaran kesên ku cihêkarî pêk anîne, vê mijarê bi kar tînin û raporekê li dijî we çêdikin; Ev rapor dikare wergirtina mafên we gellek dijwar bike.

Lewma gere ku hûn tam ser hemda xwe bin û di destpêkê da diyar bikin ku gelo **bîner/şehed** an **belgeyek** li bara cihêkariyê heye. Heke muşterî an rêbihurên din ev bûyer dîtin, divê rasterast bi wan ra biaxivin û nav û têlêfona wan binivîsin da ku dû ra bikarin wan wek şehed/bîner bi kar bînin. Belge (Name, E-Mail, wêneyên girtî ji manîtorê, bilêt û HWD) ku piştra renga bikarin wan jibo selimandiya cihêkariyê bi kar bînin, li ba xwe xwedan bikin.

Piştewaniya sazmanî. Digel heval û malbata xwe li bara cihêkariya ku we dîtiye biaxivin û wek mînak xizmetên **rêvebiriya dijî cihêkariyê li NRW`yê** (Broşorê bibînin) an navendên din bi kar bînin. Bi vî awayî hûn dikarin jibo kiryarên pêşerojê alîkarî û piştewaniyê werbigirin.

Tomarkirina bûyeran

Piştî bûyerê derdem bûyerê li ciyekî tomar bikin.. Ev kar jibo selimandina viya ku hûn ketine ber cihêkariyê gellek girîng e. Bi awayê taybet dema tomarkirina bûyeran van pirsan berçav bigrin:

- Ev bûyer li **kuû kengê** qewimiye? (wek mînak li li firoşgehê, roj, dem)
- Tamçi bûyereq qewimî? (wek mînak şikbarbûna bê hicet ji aliyê firoşkar va; Lêgerîna li çenteyê bi awayekî dijûnbar ji aliyê memûrê ewlehiyê li ber çavên xelkê)
- **Çi kes** di nava bûyerê da hebûn? (wek mînak berpîrsê firotinê û berpîrsê ewlehiyê)
- Çi kes **şehed bûn**? Çi belge **jibo selimandinê** hene?
- Gelo digel polis peywendî hat girtin?
- **Çima** li dijî we bi awayekî tund û cihêkarane reftar hat kirin? Gelo ji ber berboriya malbatê, rengê çerm, mezheb an zimanê xwe, ketî ber cihêkariyê?

Bilez mafên xwe bixwaze!

Heke hûn ketine ber cihêkariyê û dixwazin ji xwe berevaniyê bikin divê di heyama du mehan datawanên xwe li dijî (nivîsgeh/kesê) ku cihêkarî pêk aniye, ragihînin. Baştirîn rê jibo vî karî gazindeya nivîskî ye.





Infopaket Flucht und Asyl

Ez çawa dikarin piştevaniyê werbigirim?

Li North Rhine Westphalia`yê pênc nivîsgehên têkoşîna li hemberî cihêkariyê hene ku heke hûn ketin ber cihêkariyê, dikarin serî li wan bidin. Ji bilî van nivîsgehên taybet jibo têkoşîna li hemberî cihêkariyê hin navendên din ên rawêjkariyê jî hene ku dikarin alîkariya we bikin. Hûn dikarin navnîşanên navendên têkoşîna li hemberî cihêkariya dewletî li Bêrlînê (Û deverên din) li van malperan bibînin: <http://www.agg-ratgeber.de/adressen-kontakte.php>

Nivîsgehên ku lîsteya wan li jor hatiye dikarin bi şêwazên jêr alîkariya we bikin:

Hevrêti û piştevani:

Di destpêkê da rawêjkar agah bikin ku deqîq çî qewimiye. Jibo vî karî tomarkirina bûyeran dikare alîkariya we bike. Li bara dewama pêvajoyê wê behs digel we bê kirin. Hûn dikarin rêkarekê jibo çareserkirina mijarê li derveyî dadgehê (Wek mînak nameya gazindeyê an civîna taybet) bibijêrin an wê ji riya hiqûqî va bişopînin. Ji bilî viya heke hewce be, jibo arambûna piştî cihêkariya ku qewimiye, hûn ê piştgiriya hestiyarî û atîfî werbigirin. Di dawî da rawêjkar dikare bijareyên qanûnî ku jibo rakirina pêngavê li dijî cihêkariyê li ber destê we ne, jibo we şirove bike.

Navbeynkarî di dema ku nakokiyek hebe:

Nivîsgeha zanyariyan dikare civîna gotûbêja duyafî nava we û aliyê din bi amadebûna navbeynkarekî bi rê xine. Ev mijar bi taybet dema ku hûn nekarin xwe ji rûbirûbûna digel kesê ku cihêkariyê dike, dûr bikin, îdeyekê baş be (Wek mînak heke ev kes li ciyê jiyane, ciyê xebatê yan li firoşgeha nêzikî ciyê jiyana we ye).

Peywendiyên gelemperî:

Heke ji riyên navbirî li jor encamekê bi dest naxin, hûn dikarin bi alîkariya navendên zanyariyan, vê mijarê ji riya mêdyayan va bişopînin. Ev kar pîrrîcaran amoreke bibandor jibo anîna zextê li ser wî kesî /wê kesê ye ku cihêkariyê dike.

Rawêjkarî belaş e.

Quelle: <http://www.agg-ratgeber.de/checkliste.php> + <http://www.agg-ratgeber.de/unterstuetzung-durch-beratungsstellen.php>

Navendên ku li warê têkoşîna li hemberî cihêkariyê dixebitin (Nivîsgehên têkoşîna li hemberî cihêkariyê li NRW`yê)

Pädagogisches Zentrum Aachen e.V. Gleichbehandlungsbüro Mariahilfstr. 16 52062 Aachen Tel: 0241 4017778 Fax: 0241 49004 E-Mail: gbb@paez-aachen.de www.gleichbehandlungsbuero.de	Planerladen e.V. Schützenstraße 42 44147 Dortmund Tel. 0231 8820700 Fax: 0231 8820701 E-Mail: integration@planerladen.de www.integrationsprojekt.net www.planerladen.de	Anti-Rassismus Informations-Centrum, ARIC-NRW e.V. Friedenstr. 11, 47053 Duisburg Tel: 0203 284873 Fax: 0203 9357466 E-Mail: info@aric-nrw.de Internet: www.aric-nrw.de	AntiDiskriminierungsbüro (ADB) Köln Öffentlichkeit gegen Gewalt e.V. (ÖgG) Berliner Straße 97-99 51063 Köln Tel: 0221 96476300 Fax: 0221 96496709 E-Mail: info@oegg.de www.oegg.de	Antidiskriminierungsbüro Südwestfalen Heidenbergstr. 1c 57072 Siegen Tel: 0271 3175745 E-Mail: guel.ditsch@vaks.info www.vaks.info www.mediathek-siegen.de
---------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------	----------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------	-----------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------	-----------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------	-------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------------